Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Hejmar (525)
2026-09-06

www.agirimedia.org




DI VÊ HEJMARÊ DE:

"Halnet" di hevpeyvîneké de ligel Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat . 2
Rojev ....................................... 7
Hevpeyvîn ................................ 8
Civakî ......................................10
Mafê Mirov .............................. 11
Poster...................................... 12

# Mafê Diyarkirina Qederê û Pêşeroja Kurdistanê



Di qada siyasî ya Îranê de, têgeha mafê diyarkirina qederê, pir caran bi xeletî, û wekî parçekirina welat û serxwebûnê tê fêmkirin. Lê belê, di yasayên navneteweyî de ev maf berî her tiştî tê wateya ku gelê herêmekê bikaribe bi curekî azad derbarê sîstema xwe ya siyasî, birêvebirinê, geşedana aborî û ziman û çanda xwe de biryarê bide. Serxwebûn tenê yek ji encamên mimkun e, ne kite rê ye.

Mafê diyarkirina qederê di xala duyem a benda yekê ya Menşûra Neteweyên Yekbûyî û di her du peymanên navneteweyî yên mafên mirovan de bi eşkereyî hatine qebûlkirin. Hewce ye ku mirov ferqê bixe navbera mafê diyarkirina qederê ya navxweyî û ya derve:

Mafê diyarkirina qederê li Navxweyî: Beşdarbûna azad a di hikûmetê de ye, mîna xweserî, federasyon, konfederasyon, xwebirêvebirin û Otonomî û perwerdeya bi zimanê dayikê û mafê çandî di nav sînorê wî welatî de k utu welatiyê wê bizanî, wate serîde pêdiviye û te mafê welatîbûnê hebe û piştre tû dikarî daxwaza wan mafên xwe yê berheq bikî ku min serwe amaje pê kirin.

Mafê diyarkirina qederê ya derve: Weqetiyana ji nasname û cudakirina axê û xwe pênasekirin bi taybetmendiyên neteweyekî cuda, û avakirina dewleteke serbixwe weke hemî netewên ku ev taybetmendiyên te henî, tu jî dikarî bibî xwediyê Kiyan û serwerî û dewlet û welatê xwe.

Raman û teoriya weqetiyanê bo çareserkirina pirsê û geheştina bi mafan şiroveya vê ev e ku ger dewletek mafên parek ji xelkê welat ku ji wan nîne berdewam binpê bike, wan bikuje, ziman û çanda wan qedex bike û hemû rêyên çareserî û beşdariya siyasî ji wan bigire, mafê wî xelkî heye ku wek rêya dawîn ber bi weqetîn û serxwebûnê ve biçe.

Gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi salan e rastî binpêkirina mafên mirovan tê, keftiye ber komkujî û êrîşê, darvekirinên bêhejmar, hejarî û cudakarîya aborî ya pênaskirî, talankirina çavkaniyên xwezayê, qedexekirina perwerdeya bi zimanê Kurdî, Kurd nikarin li piroseyên siyasî, azadiya hizban, rojnamevanî û bi giştî mijarên çandî de bêparin, ev hemû zordariya mezin li ser gelê me ye, gelo çi rêkek maye ku em daxwaza mafê diyarîkirina qedera navxweyî bikin? Yan dema hindê nehatiye ku em behsa diyarîkirina qedera derveyî bikin?

Lê belê, divê bê zanîn ku ti partî an rêxistin nikare li ser navê tevahiya xelkê Rojhilatê Kurdistanê biryara dawîn bide. Biryara herî rast tenê daxwz û ji îradeya azad a gel xuya dibe. Lewra yekim pêngava piştî sernixûniya rêjma komara îslamî, divê rê bête dan ku gel di mercên azad û demokratîk de biryarê li ser qedera xwe bide, ji federalîzm û xweseriyê heta serxwebûna tam. Mafê gelê Kurd û gelên dine yên bêmafe li Îranê de ye heye ku li ser pêşeroja xwe bi rengekî azad biaxivin û biryarê bidin, erkê me û part û aliyên siyasî jî her nihade dive rê xweşkirin û amadekarî bo sergirtina vê mijarê be.

## Bêçekkirina milîsên Iraqî pêşeroja Herêma Kurdistanê misoger dike



Di nav pirsgirêkên ewlehî û polîtîk yên aloz de ku Rojhilata Navîn û bi taybetî dewleta Iraqê pê re rûbirû ye, hebûna komên çekdar ên nehikûmî û milîsên hevterîb bûye yek ji gefên herî mezin li ser aramiya ewlehî û pêşketina domdar li Iraqê.

RUPELA 7

## Di Nabeyna Du Blokên Hêjmon de Qedera Kurdan



Çel sal berê ev cîhana me ya sîyasî wek du blokên cuda hebûna xwe didomand. Yek qaşo alîgir û piştevanê bindest û xizanan bû, ya din jî nûnerê azadî, demokrasî û reqabeta lîberalî bû . . . .

RUPELA 5

## Kolonyalîst çawa kesayetîperestiyê li ser welatparêziyê bi ser dixe?



Di rewşa takekesîperestiyê de, dagîrker dikare bi hêsanî li ser sektora takekesîperestiyê serdest be ji ber ku di rêxistinên wiha de, welat, zimanê dayikê û çand ne pêşîn in. Lêbelê . . . .

RUPELA 9

# Mistefa Hijrî bo «Hal net»: Ligel navendgerayan nabine hevpeyman û kevrê xîmê Îraneke dêmokratîk divê pêş sernixûniya rêjîmê bê danîn

**Dîmane: Areş Yezdî**

**“Halnet” di hevpeyvînekê de ligel Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat de siyaset û rûmeta hizbê li hember rojevên siyasiyên îro yên Îran û Kurdistanê kolaye. Kak Mistefa Hijrî di wê hevpeyvînê de bi zelalî behsa nexşerê û stratejiya Hizba Dêmokrat bo xebata dijî Komara Îslamî û birêvebirina Îranê di qonaxa guzarê de kiriye. “Agirî” naveroka vê hevpeyvînê bo xwendevanên xwe amade kiriye:**



**Helsengandina Hizba Dêmokrat bo rewşa rêjîma Komara Îslamî di qonaxa dawî a temenê vê rêjîmê de çiye?**
Ez li ser wê braweriyê me ku Komara Îslamî li ser lêva kendalê sernixûniyê ye, belê diyarikirina dema herifina wê karêkî hêsan nine, çunke: ev rêjîm tevî tûşbûna bi gelek qeyranên navxweyî wek herifina aborî, ji destdana şer’iyeta navxweyî û derekî, derketina netebayîya siyasî li gupka deselatê de û çendîn sedemên din jî, hêşta jî tewana û îradeya tepeserkariya tundutîj a neraziyên navxwe heye. Herwisa tevî qeyrana dijwar a aborî, hêşta tewana dabînkirina darayiya hêzên serkutkeran heye û ev serkutkariyane herçend e li gorî demê bandora xwe ji dest didin, belê di paşxistina sernixûniya wê de ta qasekê rol bûn.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li ser wê braweriyê ye ku paşketina her rojê ya sernixûniya rêjîmê, dibe sedema têçûna canî ya zêdetir a xelkê wêzarbûyî û wêraniya zêdetir a welat; belê ji layê din ve dibe ku ev heyam bibe derfet bo pêkhatina yekiyetî û tebayiyê di navbera tev xelkê welat de bi hemû cudatiya neteweyî, olî, zimanî, fikrî û aydolojî û siyasî ve.

Ev jî bi armanca rêgirî ji paşketina zêdetir a dawiya vê rêjîmê û kêmkirina ziyanên canî û wêraniya zêdetir a welat, herwisa darêştina bername û siyaseteke din e li ser bingehê dadperwerî û dawîanîn bi zulm û cudatiyê û piştguhxistina beşek ji navçeyên Îranê û fîdakirina hemû tiştekî di pêxema navendê de ku di em nêzîkî sedsala borî de şahidê wê bûn.

Ez bawerim ku derfeta wê li cem me maye ku fikrê ji Îraneke din bikin û emê Kurd di vê peywendiyê de pêngavên giring di bo yekiyetî û tebayiyê de bihavêjin û tevî wê jî, di rêzên hevpeymaniyê de ligel komek ji hizb û neteweyên Îranê wek Ereb, Belûç, Tirk û Turkmanan de, me karî bi sehkirin bi hewcehiya hevpeymaniyê de di dewra platformeke siyasiya hevbeş de, hevkarî di navbera me de hebe û niha jî em ligel hindek ji rêkxistinên farziman de di danûstandinê de ne da ku rêka hevkariya berfirehtir ligel wan de jî xweş bikin.

**Bi berçavgirtina seng û qursaiya siyasiya Hizba Dêmokrat, çarçove û hêlên we yên sor bo hevkariya ligel pêvajoyên siyasî ên seranseriyên din çi ne?**
Kurd û neteweyên din yên pêkhênerên dêmografiyaya vî welatî di heyamê sedsala derbasbûyî de deselatdariya du rêjîmên paşayetî û Komara Îslamî ceribandin. Ev du rêjîme lîkçûna zêde di şêwazê birêvebirina welat de hebûne.

Bi wê manayê bûye ku Îrana berfireh bi pêkhateyeke dêmografiya tevlîhev ji netewe, ziman, bawerî û ayîn û mezhebên ciyawaz ve, bi ferheng û dîroka cuda ve, wek «yek netewe» hate dîtin û tev ev cudahî hatine jibîrkirin. Ev «yek netewe» ev xelkên ku li navenda Îranê de akincî ne, wate tenê Fars. Di hemî wî heyamî de hewl dane tev zarokên vê xakê ji hema destpêka xwendinê ve bi zorê zimanê Farsî fêr bibin, zêdetirîn budceya avakirinê bo vê beşê hatine terxankirin û asteke pir kêm bo navçeyên derûdorê bûye, herwisa bername bo dewlemendkirina vê kite zimanî, ferheng û dîroka vê «yek neteweyê» û asmîle kirina çand, ziman û dîroka neteweyên din cehda wan bûye. Her cûre nerazîbûnek li hember vê nedadperweriyê jî di bin navê cudayîxwaz û xeyanetê, sîxurê dujminan, sivikatîkirin bi ziman, çand, dîrok, û baweriyên olî yê xelk û netewên xeyrî fars de hatine tepeserkirin.

Hewla hizba me di tevahiya vê heyamî de di pêxema înana ser kar a deselateke dêmokratîk de bûye, deselatek ku tê de Îran ne mulkê taybetê kesekî (paşa, weliyê feqîh) yan grûp û neteweyekî, belku tê de hemû xwe bi xwediyê vî welatî bizanin, deselatdariya bi-navendkirî li Tehranê li ser bingehê yasayeke dêmokratîk di navbera tev navçeyên neteweyiyan de bê dabeşkirin ta ku ev welat bo hetahetayê ji destê dîktatoriyê rizgar bibe û xelkê wê di ewlehî û azadiyê de bijîn. Em ligel tev hizb, grûp û kesên ku baweriya wan bi damezrandina Îraneke ji vê cûrê heye û di rêya bi cîhanîna wê de xebatê dikin, amadeyê hevkariyê ne. Li berambe de jî, amade nîn in ligel wan grûp û pêvajoyên fikrî de hevkariyê bikin ku hêşta jî bo pêkînana deselateke navendgeraya din piştî Komara Îslamî dixebitin.

**Cografiyaya bakûrê rojava yê Îranê wek Urmiye, Neqede, Mîandoab, Takab û… cihê jiyana hevbeş ya du neteweyên Kurd û Tirkên Azerî ye. Di dîroka hevçax de, ev navçe her du ezmûnên pir şîrîn yên yeketiya «Komara Kurdistan» û «Hikumeta Millî ya Azerbaycanê» dîtiye, û hem rojên tal yên wek pevçon û şerê Neqede derbaz kiriye. Komara Îslamî hemî dem hewl daye van cudahiyan dîsan bîne holê. Bi berçavgirtina wê ku cenabê te xelkê bajarê Neqedê yî û ev rastiyane ji nêzîk ve haydarê, bernama stratejî ya Hizba Dêmokrat bo pûçkirin û dubarenebûna netebayîyan çi ye?**
Ji bilî parêzgeha Urmiye navçeyên din jî li Îranê de hene ku xelkê wê ji pêkhateya netewe, bawerên ayînî ên cuda pêkhatine û her yek ji wan kêm yan zêde xwediyê derbasbûya tal û şîrîn nin. Alozî û hindek caran dujminayetiya navbera xelkê van navçeyan, encama sedemên cûrbecûr bûye, ji wan siyasetên tevdanîçêkirina rêjîmên Pehlevî û Komara Îslamî bo qazanca mana xwe.

Ji ber ku ev deselatane hemî demê ji yekiyetî û tebayiya xelkê tirsiyane û ew bi sebebê lawazbûna deselata xwe zanîne, di encam de bo têkdana tebayî û çêkirina dujminayetiya di navbera xelkê de bi berdewamî di pilangêriyê de bûne. Hevdem hestê xwe-bi-mezintirzanîn û netewexwaziya tundrewane ku hindek caran di şêwaza şovînîzmê de di navbera kes û grûpan de di vê xelkê de derdikeve, ev girjiyane ji encam dane.

Bernama hizba me bo xelkê van navçeyan, ezimûnwergirtin e ji taliyên derbasbûyî û hevdem sûdwergirtin e ji yekiyetî û tebayiya şîrîn. Bîranîna van aloziyan e ku tê de tev aliyên zirar-dîtî li ser bingehê van ezmûnan, dive cehdê bikin bo darıştina yekiyetî û hevkarî û dûrkeftin ji dîroka tal û rêgirî di dubarebûna wan.

Civatgeha Tirk û Kurd di parêzgeha Urmiyê de jî divê bi berçavgirtina van ezmûnan di cihê tolestandin ji hevdu, di bîra dîtina rêçareyekî bi-hev re-jiyana aştiyane de bin û ev jî erkê dixîne ser milê tev hizbên siyasî, kesayetîên olî, mamostayên, perwerdê û rewşenbîran û tevxelkê.

**Mîtod û mîkanîzmên hevkariyê di hevpeymaniya hêzên siyasî yên Kurdistan a Îranê de çi ne? Gelo emê di pêşerojê de bereyeke Kurdistanî ya giştgir bibînin?**
Rastiya ewa ku em bi kiryar paşda mene, ew e ku li welatên wek Îranê de ku qet ezmûna dêmokrasî û karê bi-komî nehatiye kirin, înana holê ya hevkarî û karê hevbeş pir dijwar e. Gelek kes di axaftin û drûşmên xwe de xwe bi dêmokrat dizanin û behsa dêmokrasiyê dikin, lê di kiryarê de û di mêjkê heçî kîjan ji wan de binagehên dîktatoriyê reh kutane. Ji bo vê jî pêkanîna hevpeymaniyê bi zehmet çêdibe û piştî pêkanînê jî bi lez hildeweşe.

Ev li Kurdistanê cuda ye. Li Kurdistana Îranê ji ber ku hizbayetî û pirr-hizbî koka wê di civatgehê de heye û ezmûna me ya zêde di karê bi-komî de hebûye, evê bandora zêde li ser çêkirina yekgirtinê di civatgehê de daniye. Ev ezmûne di Hizba Dêmokrat de berçavtir û diyartir e, bi vê sedemê jî rêkkeftin û hevkarî di navbera grûpên cuda û takên civatgehê de berfirehtir e.

**DOMA R:2**

Mîkanîzma hevkariyan di navbera hizbên Kurdistanê de li ser jev nêzîkbûna hizban, bernamên wan e, hevdem hewl didin bo wêdedana astengên ser rêyê, û mîkanîzma vê rêçareyê jî diyalog e.

**Gelo hûn hivîdarin bi çêbûna Rojhilata Navîn a dêmokratîk ku tê de mafê tev netewe û pêkhateyan bê şer dabîn bibe?**

Siyasetên Komara Îslamî li ser bingehê îdolojiya Wilayeta Feqîh hatine darıştin. Îdolojiyek ku ji bilî xwe, hemûyan bi dujmin dizane û bi awayê cûrbecûr ligel wan di şer de ye.

Ev rêjîme di hema destpêkê de drûşma ji nav birina Îsraîlê bilind kiriye û di kiryarê de jî bi alîkariyên madî û çekdariya berfireh, dest kiriye bi rêkxistin, piştgirî ji milîsan bo şerkirin di berjewendiya Komara Îslamî de û cehdkirina destgehiştin bi çekê etomî.

Ewropa û Amerîka jî di heyamê zêdetir ji 4 dehkan de li hember van zêdegaviyên Komara Îslamî de bêdeng bûn û miamileyên xwe ligel vê rêjîmê domandin, bi vê hêviyê ku ev beşa ji siyasetên rêjîmê biguhêrin.

Belê ev amanca bi cîh nehat û di encam de Amerîka û Îsraîl çara wan nema û êrîşa giran kirine ser Komara Îslamî.

Ev êrîşane, zexteke giran in di warê leşkerî, ewlehî û bi taybetî aborî ve li rêjîmê didin, evê rêjîm lawaz kiriye û bi lawazbûna rêjîmê di dirêjheyam de, derfeta zêdetir bo xelkê Îranê di xebata dijî vê rêjîmê biafirîne.

Belê daxwaziya xelkê Îranê bi taybetî Hizba Dêmokrat, rûxana tevahî ya vê rêjîmê ye nêk tenê lawazkirina wê.

Bi kurtî, herçend her cûre guhertinek di siyasetên rêjîma Îranê de di niha de jî tenê dem-krrîn e, û tenê bi herifîna vê rêjîmê mirov hivîdar be bi rojeke baştr bo xelkê Îranê û welatên navçeyê. Divê em bizanin ku herifîna rêjîmê qonaxa yekê ye û ev herifîn rengearmanca dawî nebe, belê amanca dawî duristkirina Îraneke din e bi wan taybetmendiyan ku me baskirin.

Di dawiyê de duristbûna Rojhilata Navîn a dêmokratîk û Îraneke dêmokratîk tiştek nîne bi jinavçona deselatan û şer bê dabînkirin, belê her guhertinek di komelgehê de guherîna rûmet, têraman, û reftara wan xelkên ku divê.

Guhertin di rûmet û bîrkirina xelkê jî pêwîstî bi derbasbûna demê û ezmûnwergirtin ji derbasbûyî û rexne-ji-xwegirtinê heye. Gelû neteweyên Îranê gehiştine vê qonaxê di geşeya fikrî û cîhanbînî de ku bikanin piştî Komara Îslamî, Îraneke din ava bikin? Hêvîdar im weha be.

Peyama min bo wê armancê carake din jî pêdagirî ye li ser yekiyetî û tebayî û bi fermî naskirina fireneteweyî, zimanî, ol ya hevdu û hewldan e bo danîna xîmê Îraneke din bo hemûyan di sîbera azadî û dêmokrasiyê de.

Evane jî erkek nîn in ku bi pêşrojê bên spartin, belê kevrê xîmê wan divê ji niha ve bê danîn, paşxistina van erkan bo piştî sernixûniya rêjîmê pir dereng dibe û bi egera zêde ve dibe sedema ji destdana derfetê, ku encama wê dikare bibe sepandina dubare ya dîktatoriyê bi rengekî nû ve bo piştî rêjîma niha.

## Bahoza tevgera Jîna'yê, destpêka dawî hatina dîktatoriyê



N. Serbest Urmiye



Çar sal bi ser kuştina keça Kurd Jîna Emînî, ji aliyê rejêma Îranê ve derbas dibin. Bahoza ku ji serhildana jin, jiyan, azadiyê serhildaye, ne tenê lawaz nebûye, belku xurttir û herfirehtir jî bûye û şeqarên pêkhateya rejîma Îranê berfirehtir ji caran kirine.

Serhildana ku di payîza sala 1401an(2022) de bi kuştina keçeke ciwan ji aliyê "Geşta Irşad" a rejîmê ve dest pê bû, ne tenê protestoyeke demkî bû, belku xaleke werçerxana dîrokî û destpêka pêvajoya hilweşiyana meşrûiyeta siyasî, civakî û îdeolojîk a hikûmetekê bû ku bi dehan salan li ser tepeserkirin, ferq û cudahî danan û zordariyê hatibû avakirin.

Îro, di çaremîn salvegera vê bûyera dîroka serdem de, rejîma Komara Îslamî di kendalê wan kirîzan de ku bixwe sebebkarê wan e, hatiye dorpêçkirin. Krîzên serberedayî yên aborî, hilweşiyana nirxa dirav, jîngehparêzî û xewleketina yekcarekî ya navneteweyî, tenê beşek ji rastiya berbiçav in ku bi eşkere di civakê de xuya ne.

Lê kirîza ku ji hemûyan pitir pişta rejîmê şikandiye, nemana hitbara yasayî ya rejmê û veqetiyana gel ji rejîmê ye. Renge tepeser kirin û zordestiya rejîmê wêneyeke hêmin ji şeqamên bajar nîşan bidin, lê serhildana jin jiyan azadiyê bandoreke wiha li ser siyaset, civak û çanda gel daniye ku gurza xezeba gelên nerazî hertim di meydana dijî rejîmê de dizivire.

Taybetmendiya herî bilind a ku şoreşa Jîna'yê pitir xurt dike, bingehgirtina mafên jinan û rêkxistina daxwaz û maf û azadiyên herêmî yên jinan di tevgereeke seranserî de ye.

Tevgera ku nîşan da zilm û zordariya li ser jinan, kêmaniyên neteweyî û olî û zordariya li ser tex û qatên hejar di civakê de, bi tevahî berhema rêkxistin û pêkhateya sîstemên totalîter û diktator in.

Rejîma Îranê di rêya jordebirina hejmara li sêdare dayînê, girtin û hepiskirina çalakvanan di warên cuda de û tepeserkirina hovane ya xelkê û tevgerên civaka sivîl ve, hewil dide ku temenê xwe dirêj bike, lê rastiya eşkere eva ye ku lûleye tifengan di çi erdeke cîhanê de nekariye li hember îradeya gel de zêde li ber xwe bide û serkewe.

Îran, îro di qonaxa derbasbûna bêveger de ye. Kirîza destnîşankirina cîgirê rêberê nemayî yê rejîmê di lûtkeya desthilatê de, bêhêvîbûna giştî ji rejîmê û neçaretiya rejîmê di dabînkirina pêdiviyên bingehîntirîn yên jiyanê de, desthilat gihandiye qonaxa herî lawaz a dîroka wê.

Bahoza tevgera Jîna'yê hikûmeta zilm û zordariyê têkvedaye, herçend ku gel nirxa azadiyê bi giranî dide, lê rêrewa dîrokê ber bi serkeftina gel ve guheriye û nemana rejîmê êdî ne girîmane, belkû pirsa rojevê ye.

# Bi yektiya siyasî û amadekariya meydanî di guhertinan de em dê mafên xwe misoger bikin

Bi yektiya siyasî û amadekariya meydanî di guhertinan de em dê mafên xwe misoger bikin

**Xelkê azadîxwaz ê Kurdistanê!**

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê di civîna xwe ya dawî de ku di roja 3yê Xermananê de hat birêveçûn, nirxandineke giştî bo rewşa navxweyî ya Rojhilatê Kurdistanê û Îranê û herwisa hevkêşeyên aloz ên herêmê kir û ronahî xist ser guhertinên hestiyar, krîzên sîstema siyasî ya Îranê û wan geşedanên lezgir ku di herêmê de rû didin û tê de helwest û nêrîna xwe di barê rewşê de destnîşan kir.

Di civînê de hat tekezkirin ku tevî ku şer û pevçûn, kontrolkirina rêrêwên stratejîk û bazirganî û destbiserdagirtina çavkaniyan di herêmê de rehendeke wan a dîrokî heye, lê rewşa niha ya Rojhilata Navîn û Îranê di qonaxeke veguhastinê ya diyarker de ye û sîstema desthilatdariyê li Îranê di krîzeke kûr û bêçare de dijî ku nikare xwe ji encamên wê rizgar bike. Herwisa hat diyar kirin ku hikûmeta Îranê ji bilî şer rastî cezayên giran ên aborî û zextên pir-alî bûye ku ber bi kendalê hilweşînê an jî ji destdana kontrolê li ser herêmên cuda dibe.

Li beramber vê rewşê û guhertinên ku tên rawestandin de, em tekezî li ser hewcehiya amadekariya hemû-alî ya meydanî, siyasî û dîplomatîk dikin û em li ser vê bawerê ne ku tevgera demokratîk û azadîxwaz a Kurd li Rojhilatê Kurdistanê nabe di vê qonaxê de tenê rola temaşevan hebe, belkî hewce ye bi planeke tam û stratejiyeke zelal amadeyî her guhertinekê be. Em pêdagiriyê li ser wê yekê jî dikin ku serkeftina tevgera Kurd di navbera rehendên neteweyî de -ku pêkhatiye ji parastina mafên rewa, dabînkirina nasnameya neteweyî, mafê biryardana li ser çarenûsê û îradeya neteweyî ya Kurd di Îrana paşerojê de- ligel azadiyên jinan, pirsa demokrasiyê, daxwazên medenî û nirxên pêşkeftî yên civakê, bi hevsengiyeke serrast ve girêdayî ye.

Wek Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê em tekez dikin ku hêz û aliyên siyasî pêwîst e boçûn û karîna partiyatî bixin xizmeta berjewendiyên neteweya me û hevpeymanên xwe di asta navxweyî û derve de bihêztir bikin. Di vê rêyê de jî, pêwîst e di warê leşkerî, ewlehî, rêxistinî û dîplomatîk de gavên hevpar bêne avêtin û hewldanên hevpeymaniyê lezgîn bibin û diyalog û lobîkirin ligel navendên biryardar ên navneteweyî û hêzên din ên opozisyona demokratîkxwaz li Îranê birêve biçin. Di vê rêyê de Hevpeymaniya Hêzên Siyasî bi amadekirina dosyaya taybet li ser cinayetên Komara Îslamî ya Îranê û rewşa Kurdistanê û pêşkêşkirina wê bi navendên navneteweyî û pewendîdar re, herwisa bi pêşwaziya hevpar ji salvegera tevgera «Jîna – Jin, Jiyan, Azadî» gavê ber bi bihêztirkirina cîgeha xwe ya yekgirtî diavêje.

Di dawiya vê civînê de, hemû aliyan bi kodengî tekezî li ser hewcehiya berdewambûn û mukumbûna li ser hewldanan bo bihêztir kirina zêdetir a hevpeymaniyê kirin. Ev yek ne tenê wek pêwîstiyek bo bihêztirkirina yektiya di navbera aliyan de, belkî bi armanca xizmetkirina herî baş ji berjewendiyên xelkê Kurdistanê re û misogerkirina paşerojeke azad û demokratîk bo paşerojê tê holê.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**

**5ê Xermanana 2726**

# UNPO biryarnameyek taybet bi Rojhilatê Kurdistan û Rojavayê Belûçistanê pejirand

Li duyemîn roja Kongireya “UNPO”yê de, biryarnameyek taybet bi rewşa mafên mirovî, mafên netewî li Rojhilatê Kurdistanê û Rojavayê Belûçistanê hat pejirandin, Reşnivîsa vê biryarnameyê ji aliyê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve hate amadekirin û bi kongireyê hate pêşkêşkirin.

Biryarname tekezî ser vê dike ku netewên sitemdîtî yên Îranê wek Kurd, Belûç, Erebên Ehwazê, Tirkên Azerî û Tirkemen, bi berdewamî rastî cudatîdanînên sîstematîk, tepeserkirin û sînordarkirina mafên bingehîn ên mirovî, medenî, siyasî, çandî û netewî tên.

Li vê biryarnemeyê de îşare têkirin ku li nîvya yekem a sala 2026 a Zayînî de 654 welatiyên Kurd hatine girtin ku 30 ji wan jin û 40 ji wan zarok in. hinek ji wan haletên din, îşkence, reftara xirab, vergirtina îtirafa bi zorê, rêgirêkirin ji destpêregihîştin bi parêzerê serbixwe û girtina demdirêj bê pêwendîgirtin digel derveyî girtîgehê ne.

Herwisa biryarname balê dikêşe ser zêdebûna sepandina sizaya bidarvekirin ji aliyê rêjîma Îranê bi dijî xwenîşanderan, girtiyên siyasî, çalakvanên mafên mirovî, rojnamenivîsan, parêzeran û çalakvanên civaka medenî.

Kongireya UNPO li vê biryarnameya xwe de, nigeraniya xwe li hember mîlîtarîzekirina Rojhilatê Kurdistanê daye xuya ên wek danîna bazgehên vekolînan, danîna dema qedexeya hatinûçonê, bikaranîna hêzên çekdar û pêka raporan, dagîrkirin an bikaranîna nexweşxaneyan, xwendingehan, Mizgevt û cihên medenî bi armancên serbazî.

Li vê Biryarnameyê de ev siyasetane bi binpêkirina micid a mafên mirovî û derbelêdan bi mafên vekhevî, kirameta mirovî, desthilata yasa û mafên gelan bo diyarîkirina mafê çarenivîsa siyasiya xwe tê zanîn.

Herwis li vê biryarnameyê de îşare bi êrîşkirinên sinorşikên ên rêjîma Îranê li dijî hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê li Herêma Kurdistanê de dike.

**Li vê biryarnameyê de Kongireya UNPO, 5 xalên bingehîn pejirandin:**

**1-** Piştevanîkirina berdewam û bêmerc a xwe li Kurdên Rojhilatê Kurdistanê, Belûçên Rojavayê Belûşistanê û hemû netewên sitemdîtiyên Îranê dubare kiriye, bi taybet li pêxema diyarîkirina mafê çarenivîs, dêmokrasî, azadî, vekhevî, kerameta mirovî û teviya mafên netewî, kultûrî, medenî û siyasî.

**2-** Bidarvekirina xwenîşanderan û girtiyên siyasî û çalakvanên mafên mirovî bi tundî şermezar kir û daxwaza sekinandina lezgîn a bidarvekirinan û guherîna hemû sizayên bidarvekirinê kir ku bi sedema çalakiyên siyasî, xwenîşandanên aşitîxwazane an bikaranîna mafên azadiyên bingehîn bi ser wan de hatiye sepandin.

**3-** Daxwaza dawîanîn bi mîlîtarêzekirina deverên medenî li Rojhilatê Kurdistanê û sekinandina bikaranîna nexweşxane, xwendingeh, Mizgevt û cihên medenî bi armancên serbazî.

**4-** Gazîkirina civaka navnetewî, Netewên Yekgirtî û damezraveyên mafên mirovî bo lêkolîna lezgîn li binpêkirinên ku hatine raportkirin, dabînkirina berpirsayetî û avakirina mikanîzma bi bandor û karlêker bo çavdêrî û bi belgekirina binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistan, Belûçistan û deverên ne-Fars ên din li Îranê.

**5-** Êrîşkirinên sînorşikên bi tundî şermezar kir û daxwaza sekinandina lezgîn a wan êrîşan, rêzgirtin li serweriya axa Îraqê û parastina kesên medenî, penaber û wan kesane kir ku pêka yasaya navnetewî li jêr parêzvaniyê de ne.

Erêkirina vê biryarnameyê li duyemîn roja kombûna giştî ya UNPO li 30 Tebaxa 2026ê, pêngavek girîng bo gihandina dengê Kurd û Belûç û netewên din ên li Îranê bi civaka navnetewî ye.

# Di Nabeyna Du Blokên Hêjmon de Qedera Kurdan



N. Hesen Heranî



**Beşa 1**

Çel sal berê ev cîhana me ya sîyasî wek du blokên cuda hebûna xwe didomand. Yek qaşo alîgir û piştevanê bindest û xizanan bû, ya din jî nûnerê azadî, demokrasî û reqabeta lîberalî bû. Yek sîstema kapîtalîzmê temsîl dikir, yê din jî qaşo sosyalîzm û wekhevîyê.

Qedera gelan û bindestan wê demê jî di bazarîya nabeyna van herdu hêzan de nîqaş dibû û dihat destnîşankirin. Kîjan alî ji kîjan alî re bêtir girîng û sedemekî stratejîkbûya ew hêz ji piştevanê xwe bêtir alîkarî digirt û ev alîkari carinan dibû faktorekî tayîndêr jibo qedera wî gelî û herwiha ev dibû misogerkirina azadî û serxwebûna wî gelî. Yên ku jibo hêza piştevanîyê zêde girîngî tayîn nekira ji alîkarîya tayîndar bêpar diman û ew şoreş yan têk diçû, yan jî vediguherî alîyê sîsteme lîberal û derbaskirinekî nerm dijîya. Bi kêmasîban jî di hêla demokrasîyê de çend gavên erênî diavêt. Lê hinek gelên bindest ji van herdu alîyan jî şimaqên bêhempa dixwar û li qedera xwe ya bê talihîya maqûs rûbirû diman. Gelên ku bi alîkarîya sîstema sosyalîst bûn dewlet û serxwebûna xwe îlan kirin bi kêmasî hemî veguherîn dewletên dîktator, otorîter û di dawîyê de ew jî wek Sovyetê yek bi yek rûxîyan. Sedsala 20 an bi vî awayî derbas bû.

Cîhana du blokî ya sedsala 20 emîn serê salên 1990 de felişî û bi dawî bû. 1990-2020 an wek pêvajoyekî nabeyndar û derbasdar jîya. Ev serdema ji 30 salan pêk tê, wek cîhanekî yekalî û yek blokî tê bi navkirin. Belkî ev binavkirinekî herî raste.

2020 an virde gelek alî û herî dawî Pûtîn jî ev wekî cîhanek piralî, pir blokî bi nav dike. Ev di rastîyê de wiha be jî di dawîyê de cîhanek du blokî derdixîne pêş û ev pêvajo li ser vê bingeh û îstîqametê bi awayekî lez û bez pêşde diçe.

Di nava pergalekî wiha de û di konjonktora ku van hemî alîyan û alîyên cîvakî, bazarî û teknîkî derxistîye holê de gelo dê qedera Kurdan çi be? Pirsa yekem û herî girîng jibo me Kurdan ev e.

**Wekî me got, cîhana nû wek pir blokî bê xuyakirin jî dawîya dawî de mehkûmê du blokbûnê ye û hemî pêşketin û qewimînên diqewimin pêkhatina cîhana du blokî ji me re mizgîn dide. Şerê Îran û Emerîka bi me da nîşan ku her dewletek wekî Îranê çiqas xurt be jî, dîsa dewletek wek Çînê xwedî nikleer be jî li hember hêzekî wek Amerîka nikare li ser pîya bisekine.**

Vê rewşê hewcebûna tifaq û paktên nû hasil kir û îro wekî Çîn û Ûrisya li pey avakirina blokekî wiha digerin. Jixwe bi zanîn û dîtina min ev cîhan ji hêla zihnî de ji berêde cîhanekî dualî/du blokî bû. Lê ya ku Çîn û Ûris dikin bi rêkûpêk kirina fermi ye. Ev jî wê çêbibe. Lewre ji xeynî yek kirina hêzê tu çare nîne li pêşîya hêzên bi serê xwe mayî. Başe di nava pergalekî wiha de wê rewşa me Kurdan çawa bibe? Wê Kurd qedera xwe çawa diyarî bikin? Wê Kurd di nava vê gêleya cîhanê de çawa bikaribin xwe ji hêrana ber devê vê çerxê biparêzin?

Ev der Rojhelata navaraste. Sibê wê çi biqewime ne dîyare. Di rewşekî wiha de îmkana ku tu bikaribî sîyasetek yek alî bimeşînî nîne. Her alîyekî Kurd dema sîyaset bike mecbûre vê rastîya cihguhêr bibîne û li gorî vê rastîyê tevbigere.

Ev nîzama li Rojhelata Navîn heyî sed sal berê ji hêla sê dewletên sereke yên Ewropa ve hatibû avakirin. Sed sal bihurîn, statukoya heyî terikî û hevdu nagire. Pêdivî bi nîzamek nû dibînin. Hema bêje hemî hêzên hêjmon vêya dibînin û dizanin û li ser guherînê hemfikir in. Lê di cihbecihkirina aktorên herêmê û sînoran de, di daxwaza pay û tayînkirina hêzên nûde lihevkirin nîne. Lewre di van xalan de hemî hêzên hêjmon ji hevdu vediqetin û her hêzek berjewendî û daxwazên xwe dixwaze derxe pêş. Mînak Frensa, Îngilîstan û Îtalya naxwazin sînor biguherin.
Herwiha naxwazin aktorên herêmê jî biguherin.
Daxwaza wan tenê hêlên sîyasî, hiqûqî û îdarîye. Lê Amerîka û Îsraîl di vê hêlî de cuda difikirin. Amerîka li herêmê bi serkêşiya Îsraîlê qaîle. Dixwaze rola Tirkîyê û Îsraîlê li hev biguherîne. Ev jixwe daxwaza Îsraîle jî. Lê hêzên hêjmon yên Ewropayê vîya jibo xwe xeter dibînin û naxwazin. Mînak Rojava bû qurbana vê ne lihevkirinê. Mixabin sozê Îsraîlê bi qasî ku li ser Amerîka derbas dibe li ser van dewletên Ewropî derbas nabe û ya dawî bi dilê van dewletên Ewropî bû. Di dîtina projeksîyona Amerîka û Îsraîlê de dîzaynekî nû ku serkêşê vê dîzaynê ewin, heye.
Herwiha li derdorê xwe hêzekê xurt naxwaze. Baş dizanin ku xeyal û daxwazên Tirkîyê yên împeryal hene. Dîsa bi taybetî Îsraîl baş dizane ku yên bibin lingê vê daxwaza Tirkîyê ya împeryalî Kurd û Ereb in. Îsraîl vê yekê baş dizane û dibîne. Loma jî heta dikare dixwaze pêşîya vê helwesta Tirkîyê bisekine. Vê daxwaza xwe bi aqilê dewletên yekbûyî dabû qebûlkirin. Lê carinan van mebesta li astengên ne dîyar diqelibin. Mixabin sîyaset tenê ji jor de nayê tayînkirin, carinan bertek û astengên aktorên jêr jî sîyaset û hemleyan dixetimînin an jî disekinînin. Daxwazên aktorên jêr yên herêmê û yên hêzên hêjmon ên Ewropayê mixabin di vê xalê de dibin yek û ev yekgirtin wek astengîyek mezin derket û derdikeve pêşîya Îsraîl û Amerîka. Ev daxwazên hêzên herêmî çawa ku jibo hêzên Ewropî baş xuya dike bi kêrî sîyaseta Ûrisan jî tê. Ûris, hêzên Ewropî û hêzên herêmî tenê di mijara sînoran de bi awayekî jixweberve tên ba hev. Tişta ku herî zêde plan û projeyên Îsraîl û Emerîka dixe zehmetiyê ev hevparîya armancane. Û ev herî zêde dewarê dide qeder û berjewendîyên Kurdan. Ji ber vê rastîya li Rojhelata navîn mirov bixwaze çi bike divé mirov şert û mercên cîhanê û hêzên herêmê ji ber çavan nexe û bigire balê. Nexwe carina hêza mirov hebe jî mirov di nava anafora derdor de winda dibe.

Taybetmendiya din eve: blokên ku nû çêdibin şerê hêjmonîk dikin. Ev şerane ne şerê parastin û rizgarkirina milet û bindestan e. Şerê parekirina jêderk û çavkanîyên aborî û enerjîyê ne. Helbet di vî şerî de her hêzekî hêjmon pêdivî bi hêzên herêmî dibîne û bi gorî vîya têkilî bi hêzên herêmî re çêdike. Ya rast û hosteyî ewe ku mirov xwedî vîzyonekî hevbeşê planên van hêzan û demê be ku mirov bikaribe xwe li kêleka van projeyên pêşeroje bicîh bike. Mayîna li dervayî van projeyan di van sirûfên cîhana heyî de mixabin jibo her gelî mirin û koletîye. Divê em şaşiyek wiha nekin. Ti derfet û çarenûsa me Kurdan nîne ku em bikaribin bi tena serê xwe çarenûsa xwe diyarî bikin. Ev ne daxwazeke, ev rastîyekî demê û şert û mercên heyî ye.

Divê em baş bizanibin ku ev cîhana du blok ku di merîyetê de heye û di fermîyetê de jî hêdî hêdî çêdibe, ne du pergalên sedsala 20 anin. Ev herdu blok jî împeryalin, kapîtalîstin û hêjmonî ne. Yek cudatîyekî wan a biçûk heye. Alîyek hindik be jî nîrxên mirovahîyê wekî azadî, adalet, demokrasî diparêze, hêza din jî totalîterîzm, otorîterîzm û dîktatoriyetê diparêze. Ev yek bixwe jibo bindestan sedemên alîgirîyê diafirîne û ev alîgirî jibo miletên ku mafên xwe yên azadî û netewî bidest nexistine bêtir girîng dibe. Gelê Kurd ew gel e ku hê jî di rojhelata navarast de mafên xwe yên netewî û mirovî bidest nexistîye. Bidestxistin û misogerkirina mafên netewî şerte û heq e. Di rewşek wiha de cih û alîyê Kurdan dîyare. Ew alî yê ku ji van mafan re rêz û piştgirî dide ye. Ev jî ji bloka Rojhelata navarast bêtir, ya rojava dixuye.

**Dom heye ……**

# Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de


N. Dr. Mehmûd Ebas

**Beşa Şeşem**

### Aborî li Şûna Çekê: Tekoşîna Nû ya Gelan

Mayîn û berdewamiya gelan û projeyên wan ên neteweyî û ramyarî êdî tenê bi çek û berxwedana li meydanê ve girêdayî nîne. Îro, ji her demê zêdetir, ew bi şiyana wan a avakirina aboriyeke berhemdar, civakeke ku dikare berdewam bike, û damezrandinên ku jiyana rojane ji hilweşînê biparêzin ve girêdayî ye. Di cîhana nû de nakokî tenê li eniyên leşkerî nayên diyarkirin, ew li bazaran, zanîngehan, di teknolojiyê de, di torên berhemanînê de û di şiyana veguheztina civakê ji komeke ku hêza wê her roj tê xwarin bo hêzeke ku dikare bimîne û pêşbaziyê bike, tên diyarkirin.

Ji vir ve, pirsa Kurdî îro hêj zêdetir girîng dibe: Ma tekoşîn hîn jî tenê wek ramyarî, çek û helwest tê têgihiştin, an aborî bûye eniya herî kûr di diyarkirina çarenûsa gelan de?
Bêguman, çek di qonaxên dirêj ên dîroka tevgera Kurdistanî de amûreke neçarî ya parastina hebûn, nasname û mafên bingehîn bû. Gelê Kurd li hember desthilatên dagirker û navendperest ên tund hatibû danîn, desthilatên ku doza wî ne wek doza gelekî, lê wek pirsgirêkeke ewlekariyê didîtin. Ji ber vê yekê, tekoşîna çekdarî di hişmendiya Kurdî de ne zêdebariyek bû û ne jî hilbijartineke tenê ramanî, di gelek deman de ew bersivek bû li hember zordestî, nasnekirin, qirkirin û koçberkirina bi zorê.

Lê veguherînên sedsala bîst û yekem pêdivî bi nûxwendina wateya hêzê dikin. Hêza nûjen êdî tenê bi jimara şervanan nayê pîvan, ne jî tenê bi şiyana tevgerê ya parastinê. Ew bi şiyana avakirina aboriyekê tê pîvan ku civakê biparêze, bingeheke aborî ji ramyariyê re ava bike û rê li ber wê bigire ku doz bi temamî bikeve bin bandora guherînên herêmî û helwestên dewletên mezin. Gelên ku aboriyeke berhemdar tune be, her çiqas doza wan dadmend be û dîroka wan tijî fedakarî be jî, hîn dibe ku lawaz bimînin. Dewletên mezin bi xwe jî êdî tenê xwe dispêrin şerê rasterast. Aborî bûye yek ji çekên herî bihêz ên vê serdemê, û şerê niha di navbera Amerîka û Îsraîlê ji aliyekî û Îranê ji aliyê din ve, nimûneyeke eşkere ye. Cezayên aborî, kontrola enerjiyê, bazar, veberhênan, teknolojî û zincîreyên berhemanînê bûne amûrên bandorkirinê ku bandora wan ji artêşan kêmtir nine, carinan jî dirêjtir û kûrtir e. Yê ku vê rastiyê nexwîne, di nav xwendineke kevn de dimîne ku hêz tenê di çekê de dibîne û ji bîr dike ku heman çek jî pêdivî bi aboriyekê heye ku wê biparêze, civakekê heye ku barê wê hilgire, û damezrandinên ku rê li ber veguherîna wê bo barekî li ser milê gel bigirin.

Dewletên Yekbûyî berî artêşan bi dolar û teknolojiyê serdestiya xwe li cîhanê fireh kirin. Japonya piştî têkçûnê bi pîşesazî û zanînê rabû ser piyan. Chûyan jî belavbûna xwe li cîhanê bi rêya perwerde, sermaye û rêxistinê veguherandin toreke bandorkirinê. Her çiqas rewşên van ezmûnan ji hev cuda bin jî, hemû yek tişt dibêjin: Gelê ku aboriyeke berhemdar ava neke, nikare doza xwe demeke dirêj biparêze.

Li vir yek ji girêkên herî kûr ên tevgera Kurdistanî derdikeve pêş. Di gelek beşên xwe de, ew zêdetir tevgerê ramyarî, ewlekarî û leşkerî bûye, ne projeyeke aborî ya hevgirtî. Ji aliyê dîrokî ve sedemên vê yekê hebûn, ji ber ku Kurdistan bi sedsalan dabeşkirin, paşguhkirin, şer, valakirina çavkaniyan û bikaranîna aboriyê wek amûra bindestkirinê dît. Lê berdewambûna vê kêmasiyê îro projeya Kurdî li ber metirsiyeke bingehîn dihêle: ku bikare berxwe bide, lê nikare bibe ezmûneke aram, berhemdar û xwedî jiyaneke dirêj.

Ezmûna Başûrê Kurdistanê mînaka eşkere ye ku girîngî û metirsiya aboriyê bi hev re nîşan dide. Lê di heman demê de jî nîşan da ku gava aborî bi petrolê, mûçeyan, dahatên bêberhem, nakokiyên partiyan û kêşeyên bi Bexda û derdorê re girêdayî bimîne, bi her aloziyeke ramyarî an darayî dikare bileqe.

Bi guherîna rewşên herêmî û navneteweyî, paşveçûna hinek destkeftan, kûrbûna zehmetiyên jiyanê, zêdebûna dorpêçê, koçberî û bêkarî, eşkere bû ku lawaziya aborî ne tiştekî biçûk e. Ew yek ji sedemên zû lawazbûn û vekirîmayîna ezmûnê li hember zextan bû. Gava ezmûnek ne xwediyê çerxeke berhemanîna navxweyî be, ne avahiyeke xurt a karûbaran hebe û ne jî bikare derfetên kar ji bo mirovan biafirîne, civak zûtir westiyayî dibe û damezrandin jî bi zexta yekem a mezin re zûtir dileqînin.



Ev ne tenê pirsa Başûr û Rojavayê Kurdistanê ye, lê ya gelê Kurd li hemû beşên Kurdistanê ye. Kurd li Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê, û herwiha li Ewropa û Amerîkayê, xwediyê hêzeke mezin a mirovî, zanistî û aborî ne; lê ev hêz hîn bi qasî mezin ve belav û bêgirêdan e. Heger dîtineke nûjen a Kurdistanî ji bo rêkxistina van hêzan hebûya, Kurdên li derveyî welat dikarîn bibin pireke rastîn di navbera Kurdistanê û cîhanê de, ne tenê dirêjahiya hestyarî ya dozê.

Endezyar, bijîşk, mamosteyê zanîngehê, xwediyê kar, bernameçêker û yê xwediyê ezmûna rêveberiyê, hemû beşek in ji tekoşîna nû ya mayînê, heger rola wan di nav dîtineke dûrnihêr û rêkxistî de bê bicihkirin, ne tenê di bersivên demkî de. Aborî li vir ne tenê bazirganî ye, ne jî tenê başkirina asta jiyanê. Ew avakirina bingeheke aborî ye ji bo biryara ramyarî, serbixwebûna kêm-zêde, û pêşîgirtina li hilweşîna civakê di her dorpêç, gef an guherîna helwestên dewletan de. Civaka ku xwarina xwe berhem tîne, çandiniya xwe pêş dixe, pîşesaziyên biçûk ava dike, di perwerde û teknolojiyê de veberhênan dike û ji ciwanên xwe re kar diafirîne, ji civakeke ku bi alîkariyan, mûçeyan, aboriya şer an li hêviya tiştê ku hêzên derveyî didin dimîne, zêdetir dikare xwe biparêze.

Ji ber vê yekê divê pirsa Kurdî ji "Em çawa hebûna xwe biparêzin?" derbasî pirsên kûrtir bibe: Em çawa vê hebûnê bikin hêzeke berhemdar? Em çawa civakekê ava bikin ku tenê nemîne, lê xwediyê amûrên berdewamiyê jî be? Em çawa ji ramanê rizgariya demkî derbasî avakirina dirêjdemê bibin?
Nûnasandina tekoşîna Kurdî di vê qonaxê de nayê wateya devjêberdana ji mafê parastina xwe, ji mafên neteweyî an ji bîranîna tekoşînê. Wateya wê firehkirina têgihiştina tekoşînê bi xwe ye. Tekoşîn di vê sedsalê de tenê hilgirtina çekê nîne gava neçarî wê ferz dike; ew avakirina dibistanê ye, zanîngehê ye, kargehê ye, zeviya çandiniya nûjen e, kompanya ye, navenda lêkolînê ye û damezrandina ku mirovê Kurd ji qurbaniyekî herdemî veguhezîne hêzeke berhemdar.

Ya ku tê xwestin ne tenê berxwedan e, belkî avakirin e. Ne tenê parastin e, belkî damezrandin e. Ne tenê parastina destkeftên heyî ye, belkî avakirina bingehên ku wan bidomînin. Cîhan bi avahiyên aborî yên lawaz re nerm nabe û demeke dirêj girîngiyê nade yê ku nikare çavkaniyên xwe rêk bixe, civaka xwe biparêze û pêdiviyên xwe berhem bîne.
Tekoşîna nû ya gelan êdî tenê li eniyên şer nîne; ew di aboriyê de ye. Gelê ku xwediyê aboriyeke berhemdar û afirîner be, di ramyariyê de dengekî bihêztir, di cîhanê de cihêkî bi koktir û di parastina mafên xwe de şiyaneke mezintir heye. Lê gelê ku di çerxa lawazî, xerckirin û girêdayîbûnê de bimîne, doza wî her çiqas dadmend be jî, bi her guherîna hevsengiya hêzan re dikeve bin metirsiyê.

Ji vir ve, tevgera Kurdistanî di serdema veguherînên mezin de pêdivî ye aboriyê bike beşek ji navenda hişmendiya xwe ya neteweyî, ne pelgeyek ku were paşxistin ta piştî çareseriya ramyarî. Aborî qonaxeke piştî tekoşînê nîne; ew yek ji bingehên serkeftina wê ye.
و
Yê ku hêza jiyanê ava neke, dê her roj ji nû ve neçar bimîne hebûna xwe biparêze.

**Berdewam dike...**

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicirî”:**

**“Em ê nebin hevalbendên navendgirayan û divê kevirê bingehîn ê Îraneke demokratîk berî hilweşîna rejîmê were danîn”**



**“Mistefa Mewlûdî”:**

**“Em nekevin nava şerekê ku mafên Kurdan tê de neyên misogerkirin”**



**“Donald Trump”:**

**“Ger pêwîst be, ez ê sed caran êrîşî Îranê bikim”**



**“Benjamin Netanyahu”:**

**“Komara Îslamî di “qonaxên dawî yên hebûna xwe de ye” û hemû pergalên Îsraîlê ji bo hilweşandin û têkbirina vê rejîmê dixebitin.”**

# Bêçekkirina milîsên Iraqî pêşeroja Herêma Kurdistanê misoger dike



N. Eskender Ceiferî



Di nav pirsgirêkên ewlehî û polîtîk yên aloz de ku Rojhilata Navîn û bi taybetî dewleta Iraqê pê re rûbirû ye, hebûna komên çekdar ên nehikûmî û milîsên hevterîb bûye yek ji gefên herî mezin li ser aramiya ewlehî û pêşketina domdar li Iraqê.

Di vê mijarê de, Balyozê Yekîtiya Ewropayê li Iraqê di daxuyaniyên xwe yên herî dawî de tekezî li ser hewcedariya kontrolkirina tewaw ya çekan ji aliyê dewleta Iraqê ve û bêçekkirina komên milîs kir û ev pêngava pêdivî, wek pêngaveke pir mezin û bi mifah li ser xêra Herêma Kurdistanê bi nav kir.

Ev helwesta dîplomatîk a eşkere û zelal dengvedanek mezin di derdorên polîtîk û civakî yên Hewlêrê de wergirt, ji ber ku Herêma Kurdistanê wek herêmeke fêdêral û heya asteke gelek aram hemî demê herî zêde ji ber çalakiya neyassayî û xweser a komên çekdar ên nehikûmî yên Îraqî zirar dîtiye.

Nêrîn û lêkolîna li ser guhertinên salên dawî nîşan dide ku çima her hewlek navdewletî û netewî ji bo bidawîanîna bikaranîna çekan a nehikûmî, rasterast bi pêşeroja aborî, polîtîk û ewlehî ya Herêma Kurdistanê ve girêdayî ye.

Herêma Kurdistanê di dirêjahiya çend dehsalên borî de wek herêmeke amade ji bo geşekirina aborî, kişandina semyanên biyanî û pêşxistina jêrxanan hatiye nasîn û hemî demê roleke sereke di aramiya Iraqê de lîstiye. Lê tevî vê jî, hebûna komên milîs ên hevterîb an paralêl ligel dewleta Iraqê ku piraniya wan guhdariya fermandariya fermî ya hêzên çekdar ên hikûmeta navendî ya Iraqê nakin, hertim bûye sedema gefê li ser jiyana rojane ya welatiyan û çalakvanên aborî li vê herêmê.

Jêrxanên jiyan û stratêjîk ên Herêma Kurdistanê, ji wan, Balafirxaneya Navdewletî ya Hewlêrê, qadên neft û gazê û navçeyên niştecîhbûnê gelek caran bûne armanca êrîşên rakêtî û balafirên bêfirokevan ên van koman û ev kiryar ji bilî çêkirina rewşeke tirsê ya ewlehî, zirarên darayî yên giran digihînin aboriyê. Ji ber vê yekê, tekeziya Yekîtiya Ewropayê li ser pêwîstiya yekdestiya tewaw ya çekan di destê saziyên yasayî û fermî yên welat de, rasterast bersiva yek ji daxwazên sereke û domdar û fikarên ewlehî yên xelk û berpirsên Herêma Kurdistanê ye. Dîplomasiya Ewropî li ser wê baweriyê ye ku ti welatek bêyî kontrola tewaw li ser amûrên desthilatê û komkirina çekên neyassayî nikare bigihe serweriya yasayê û aramiya rastîn.

Yekîtiya Ewropayê ku hemî demê piştevaniya xwe ji bo bihêzkirina avahiyên yasayî li Iraqê nîşan daye, hebûna komên çekdar yên nefermî wek astengiyeke micid li ser rêya bihêzkirina pêwendiyên yasayî û fêdêralî di navbera Bexda û Hewlêrê de dibîne.

**Di yasaya bingehîn a Iraqê de, hêzên Pêşmerge yên Herêma Kurdistanê wek beşek ji sîstma bergirî û ewlehî ya fermî ya welat hatine nasîn, lê rewataya yasayî ya komên milîs yên dervayî kontrola hikûmetê nîn e û bêçekkirina wan dikare bibe bingehek ji bo çareserkirina nakokiyên kevnar ên darayî, neftî û sînorî di navbera Hewlêr û Bexdayê de di rewşeke dûr ji zexta leşkerî de.**

Cîbicîhkirina şîreta Yekîtiya Ewropayê ya li ser bêçekkirina komên neyasayî, dê destkeftên pir mezin ji bo pêşeroja Herêma Kurdistanê bi xwe re bîne. Destkefta yekem a vê pêvajoyê, bidawîhatina gefên domdar ên ewlehî û êrîşên bi hajek û balafirên bêfirokevan li ser balafirxane û jêrxanên ênêrjiyê ye ku ewlehiya derûnî ya welatiyan bi tewawî misoger dike. Ji bilî vê, bilindkirina asta ewlehiyê dibe sedema kişandina zêdetir a semyanên biyanî û kompaniyên mezin ên navdewletî. Herwisa rêya Herêma Kurdistanê xweş dike ji bo ku bibe navendeke balkêş a aborî ji bo navçe û cîhanê jî. Ji aliyekî din ve, dema ku mentiqa zor û çekan cihê xwe bide diyalog û yasayê, Herêma Kurdistanê dikare pişta xwe bi yasaya bingehîn germ bike û bi awayekî bihêztir, mafên xwe yên darayî û pişka bûdceyê ji hikûmeta navendî bixwaze. Herwiha yekdestiya çekan di destê hikûmeta navendî de alîkariya çêkirina aramiyê li navçeyên ziyanpêketî mîna Şengalê dike û rê ji bo vegera ewleh ya koçberan xweş dike.

Tevî vê nêzîkatiya zelal a navdewletî û pêşwaziya Herêma Kurdistanê, bêçekkirina komên milîs ji ber bandora wan a politîk û aborî, pêvajoyeke pir aloz e û hewcedarî vîneke bihêz a politîk li Bexdayê heye. Serkirdeyên Herêma Kurdistanê gelek caran ragihandine ku ew ji bo yekdestkirina hebûna çekan di destê saziyên yasayî de piştevaniya her hewlek hikûmeta navendî ji bo kontrolkirina komên neyasayî dikin. Bi dîtina Hewlêrê, take rêya rizgarkirina Iraqê ji qeyranan, rêzgirtin ji yasaya bingehîn, parastina bingeha fêdêralî û kurtkirina destê wan koman e ku xwe ji yasayê bilindtir dibînin. Gotinên ew dîplomatê Ewropî careke din nîşan dan ku civaka navdewletî ewlehiya Herêma Kurdistanê bi aramiya tevahiya Iraqê ve girêdayî dibîne û bihêzkirina serweriya yasayê, take garantî ji bo pêşerojeke ewleh û zelal li navçeyê ye.

**Di hejmara vê carê a Rojnameya Agirî de, li ser pirsa şer û aloziyên dinavbera Amerîka û Rejîma Îranê û aloziyên ku di deverê de hene, me digel Rêzdar Kovan Amedî Serokê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Siwêdê hevpeyvîn encam daye.**



Hevpevîn.Kovan Amedî

Hevpeyvînkar. Hesen Mukerem

**1 - Şerê vê dawiyê di navbera Amerîka û Komara Îslamî de derxerê çiye? Gelo nîşan jî destpêkirina şerek berfireh e?**
Kovan Amedî: Êrîşên vê dawî yê Amerîkayê, nîşan dide ku agirbesta berê pir lawaz ketiye, ji xwe agirbestek şiklî bû, nu şer kekite qonaxake raste rast. Êdî tenê şerek di navbeyna hevpeymanên heremî wekî Îsraîl, Ordon û Emîratên Yekbûyî yê Eraban, Amerîka û Îran rasterast li hev dixin. Amerîka di vê qonaxê de li hedefên leşkerî û stratejîk yên Îranê wekî Girava Larkê û şûnên leşkerîyên stratejîk ya Îranê dixe.

**2 - Berfirehbûna êrişan ber bi welatên herêmê ve, heta çi qasekê dikare hevsengiya siyasî û ewlehiyê ya Rojhilata Navîn biguherîne û welatên Erebî bêtir nêzîkî Amerîkayê bike?**
Şerê niha bi kontrol tê meşandin, lê metirsiya berfirhbûna şer gelek bilind e. Nirxandina min ew e ku Îran êrîşên xwe li ser basikên Amerîka yên li Ordon, dê domdar be, hejmarek berbiçav yê leşkerên Amerîkî bên kuştin, astengkirina Tengava Hormozê bidomîne, ketina Îsraîlê bi bejayî bo Lubnanê, Komên çekdar yê Iraqê li dijî Îsraîl û Amerîkayê, dikare agirê şer gurtir bike û şer berfirh be. Lê divê meriv ji berfirehbûna şer zêde hêvî neke ku hemû dewletên Erebî bi yek dengî bikeve nav bloka Amerîkayê. Dibe ku di warê ewlehiyê de bêtir pişta xwe bidin Amerîkayê. Heta niha li ser alîbûna xwe ragîhandinek nedane. Ger bikevne aliyê Amerîka, hevkariya wekî, hişyariya radarê hîn bi leztir be, parastina wan li dijî muşek û dronan bê kirin, garantiya ewlehiyê û çekên pêşketî bide wan, hebûna leşkerên Amerîkayê li heremê bê zêdekirin û qet nebe bo wextek ne diyar mayende be.
Di heman demê de, hema hemû welatên Erebî têkiliyên xwe bi Çîn, Pakîstan, Tirkiye û Ewrûpayê re heye. Wê bixwazin ku berdewamiya van têkiliyên xwe yên dîplomasî û aboriyê biparêzin. Ango wê diwarê têkiliyê aborî û dîplomasiyê de xweseriya xwe biparêzin.


**3 - Bûna Tengava Hormozê weke yek ji navendên sereke yên pevçûnê, çi encamêk ji bo aboriya Îranê, bazara cîhanî ya wize û cih û pêgeha siyasî ya Komara Îslamî dê hebe û di niha de dikare weke kartek givaşê bê bikaranîn?**



Tengava Hormozê ji bo Îranê hem çekeke givaşê ye hem jî xala wê ya lawaz e. Tehran dikare bi tehdîd, êrişên hilbijartî, mayîn, kontrola keştiyan û bilindkirina xetera seyrûseferê bazara enerjiyê bihejîne, lê bi temamî girtina tengavê dê di heman demê de aboriya Îranê jî bikuje û dijberên wê qada navdewlwtî de dijminan li xwe zêde bike…
Encama Bandora aborî li ser Îranê
Piraniya hinardekirina nefta Îranê di rêya Tengava Hormozê re derbas dibe. Ji ber vê yekê, girtina tengavê dikare:
**A -** Dahata neftê kêm bike û pereyê neftê ji bo budceya dewletê têrê neke û qîmeta pereyê Îranê bixîne.
**B -** Mesrefên bazirganiyê bilind bike, bîmeya keştiyan, kirêya tankeran, parastin û derengketina baran biha bike.
**C -** Îran tenê neftê di kendavê de hinarde nake. Ji bo hin mal, derman, xwarin û parçeyên pîşesaziyê jî bi rêya deryayî ve girêdayî ye.
**D -** Kêmbûna pere û enflasyonê bilind bike, kêmbûna dahata dolarê dê rasterast li ser jiyana rojane bandor bike.
Îran, ji bilî Tengava Hormozê xeta boriyê ya Goreh-Jask jî heye ku rêyeke stratejîk a boriya petrola xav e ku li seranserê peravên başûr û başûrê rojhilatê Îranê dirêj dibe. Tê gotin ku nêzî 90% ji hinardekirina nefta Îranê bi Hormozê re tê girêdan.
Hormoz ne tenê rêya nefta Îranê ye; beşeke pir mezin a nefta Erebistana Siûdî, Iraq, Îmarat, Kuweyt û Qeterê jî ji vir derbas dibe. Ji ber vê yekê, heta astengkirina sînordar jî dikare encamên mezin çêbike. Wek mînak: Bîme û kirêya keştiyan bilind bibe, Hin keştî derbas dibin, yên din rawestin; bazar ne aram û siyasî dibe, Neft û Gaza kêm dibin; bihayê elektrîk, veguhastin û hilberînê li Asya û Ewropayê bilind dibe. Astengkirina berfireh û dirêj, Rezervên stratejîk tên bikaranîn, aboriya cîhanî hêdî dibe û metirsiya enflasyon û daketina aboriyê bigîje asta herî bilnd.
Ji ber vê yekê jî Komara Îslamî di pêgeha siyasî da ji niha ve weke kartek givaşê bikar tîne.
Di demeke kurt de, kontrola tengavê dikare pêgeha Îranê bihêz bike:
Tehran nîşan dide ku dikare nirxê enerjiyê û ewlehiya welatên Kendavê bandor bike.
Dewletên ku ji neft û Gazê re hewcedar in, ji bo agirbest an danûstandinê li Waşington û aliyên din zextê dikin.
Komara Îslamî dikare di navxweyê de wê wekî nîşana berxwedan û desthilatê pêşkêş bike, lê di demeke navîn û dirêj de dikare pêgeha wê lawaztir bike:
Welatên Erebî dibe ku bêtir li parastina Amerîkî û hevkariya dijî-Îranê bicivin.
Çîn û xerîdarên Asyayî, ku aramiya rêya enerjiyê dixwazin, dikarin ji Tehranê aciz bibin.
Îran dikare wekî tehdîdek ji bo bazirganiya navneteweyî bê dîtin û ji bo ambargo, operasyona deryayî an êrişên leşkerî piştgirî zêde bibe.
Xerîdar dê di demeke dirêj de rê, borî û çavkaniyên alternatîf ava bikin; wê demê nirxa stratejîk a karta Hormozê jî kêm dibe.

**4 - Hevdem digel givaşên leşkerî bo ser rejîma Îranê, cezayên aborî û krîza aborî ya navxweyî jî heye, ev kirîzane heta çi astekê dikarin bandor bixin ser rejîmê û hêz û şiyana Komara Îslamî bo rêvebirina krîzên navxweyî û derveyî di niha de heta çi astekê ye?**
Givaşa leşkerî, cezayên aborî û krîza navxweyî kapasîteya Komara Îslamî bi girîngî kêm dike, lê lawazbûna aborî bi tena xwe nayê wateya ketina rejîmî di nêzîk de. Rejîm hîn di warê qutkirina nerazîbûnê, parastina navendên desthilatê û bersiva leşkerî ya asîmetrîk de şiyana girîng heye; lê ji bo rêvebirina şerekî dirêj û, di heman demê de, aramkirina civakê kapasîteya wê her roj tengtir dibe.
Cezayên aborî rêya firotina neftê, veguhastina pereyan, peydakirina teknolojiya pêşketî û veberhênana derve teng dikin. Givaşa leşkerî jî xercên parastinê zêde dike û bîme, bazirganî, hilberîn û dahata dewletê dixe bin zextê.
Bandora herî girîng a li ser şiyana rejîmê ev in:
Pere kêm dibe ji bo mûçe, alîkariyên xwarin û sotemeniyê, av, elektrîk, tenduristî û avakirina binesaziyê dikeve astek xeternak.
Dewlet neçar dibe di navbera aramkirina civakê û pêşxistina mûşek, dron, hêzên ewlehiyê û hevpeymanên herêmî de yêkê hilbijêre.
Qeyran tenê hejariyê zêde nake; bawerîya gel bi jêhatîbûn û meşrûîyeta rejîmê jî xirab dike.
Qeyrana aborî dikare rejîmê lawaz bike, lê mekanîkî naxe. Bo ketina rejîmekê, divê çend guhartinê grîng çê bin ku girêdana wan bi hevra hebin. Wekî: Nerazîbûna gel berfireh, domdar û bi rêxistinkirî be.
Di nav elîta desthilatê de, bi taybetî di nav Spaha Pasdaran, hêzên ewlehiyê û burokrasiya dewletê de şikestin çêbibe.
Ev xalên li jor qeyrana aborî, kêmasiyên jiyanî û nerazîbûna siyasî û bingeha protestoyan fireh dikin.
Lê Îran hîn çend amûrên bandorker hene:
Wekî, Mûşek û dron: Dikarin bingeh, keştî, binesaziya enerjiyê û bajarên dûrê hedef bigirin.
Tora hevpeymanê xwe, bi grûpên hevalben li Iraq, Yemen, Lubnan û deverên din bikar bîne.
Ya herî grîng erdnîgariya Îranê ye. Welatek mezin û çiyayî ye; dagirkirin an têkbirina tevahî wê di her warî de pir zehmet be.
Lê lawaziyên wê jî girîng in:
Parastina hewayî û binesaziya leşkerî dikarin di êrişên domdar de xirab bibin.
Rûsya û Çîn dikarin piştgirîya dîplomatîk û aborî bidin, lê ne teqez e ku ji bo rizgarkirina rejîmê bikevin şerekî rasterast.
Xala herî xeternak ji bo rejîmê ne tenê enflasyon an bombebarana Amerîka û Îsraîlê ye, pêra bi şikestina elîtê ye. Heke Spaha Pasdaran û hêzên ewlehiyê yekgirtî, mûçedar û fermandar bimînin, Komara Îslamî dikare krîzeke pir giran jî derbas bike. Heke dahata neftê qut bibe, mûçe û alîkarî têk biçin, protestoyên giştî û grevên petrolveguhastinê dest pê bikin û di nav elîtê de dubendî çêbibe, wê demê krîza aborî dikare ji givaşeke giran veguhere qeyra mayîna rejîmê.

# Kolonyalîst çawa kesayetîperestiyê li ser welatparêziyê bi ser dixe?



N. Hesen Mukerem

Di rewşa takekesîperestiyê de, dagîrker dikare bi hêsanî li ser sektora takekesîperestiyê serdest be ji ber ku di rêxistinên wiha de, welat, zimanê dayikê û çand ne pêşîn in. Lêbelê, di rêxistinên şorişgerî ên ku ne takekesperestin de, ziman, çand û ax pêşîn in. Di vê rewşê de, dagîrker nikare bi hêsanî rêxistinên wiha hilweşîne an jî ji holê rake ji ber ku ew bi kok, esl, welat û dîroka xwe ve girêdayî ne û teslîmî dagîrkeriyê nabin.

**Qazî Mihemed, Stalîn, û Sînorê Di Navbera Takekesperestî û Welatparêziyê de**

Her neteweyek di rêya xwe de demek derbas dike ku navên wê dibin hilgirên nasnameya wê; navên ku carinan bi etîketan, carinan bi xwînê, û carinan jî bi bêdengiya dîrokê têne jibîrkirin. Qazî Mihemed yek ji wan navan e; melayekî ku ji dilê mizgeft û dadgehê derketiye, Hizba Dêmokrat a Kurdistanaê ava kiriye, û Komara Kurdistanê di Rêbendana 1324an a Rojî de ragihand.

Komarek ku tenê 11 mehan dom kir, lê navê wê di bîra neteweyekê de her û her maye. Pirsa vê gotarê duqat e: Çima hikûmeta dagîrker Qazî Mihemed bi Stalîn ve girêda? Û cudahiya bingehîn di navbera "takekesperestî" û "welatparêziyê" de çi ye?

**Heman cudahî ku di hin rêxistinan de wiha tê zanîn her tişt girêdayî bi serok e!**

Piştî bidawîbûna şerê Cîhanê yê Duyemîn, dema ku artêşa Sovyetê, berevajî soza xwe, hîn jî bakurê rojavayê Îranê dagir dikir, Qazî Mihemed, dadwer û siyasetvanekê xelkê Mehabadê, Komara Kurdistanê ragihand. Ev komar li kêleka "Hikûmeta Xweser a Azerbaycanê" ya bi serokatiya Cefer Pîşhûrî hate damezrandin, û her du jî di çavkaniyên dîrokî de weke dewlet bi fermî hatine nas kirin.

Piştî vekişîna tevahî ya hêzên Sovyetê û vegerandina herêmê ji hêla hikûmeta navendî ve, Qazî Mihemed hate girtin, li dadgeheke leşkerî bi tohmeta "li dijî yekparçeyiya axa welêt tevgerîn" hate dadigehîkirin û di 10ê Xakelêweya1326an aRojî de hate îdam kirin.



Qazî Mihemed bi xwe înkar nekir ku Sovyetan piştgiriya avakirina komarê kirine, her çend wî tekezî kir kuHizba Dêmokrat a Kurdistanê partiyek komunîst nine û wî di dadgehê de dubare kir ku "her tişt bi îradeya Rûsan nehatiye kirin". ji bo rewakirina zext û darvekirinan, hikûmeta Îranê neçar ma ku tevgerê weke"komployek biyanî" û serokê wê wekî "ajanek biyanî" nîşan bide.

Lêbelê, vegotinên dîrokî ne yekalî ne.

> **Zanayê fransî Chris Kochera li ser Qazî Mihemed dinivîse ku ew "ne Marksîst, ne sosyalîst, ne jî lîberal bû, lê rêberê jîr û têgihîştî yê tevgera rizgariya neteweyî bû" û "welatparêz û pêşvero" bû ku heta roja darvekirina xwe bawer dikir ku Yekîtiya Sovyetê bûye dostê wî.**

Di vê rewşê de, rêber ji statuya "xizmetkar" ber bi "xwedayekê" ve tê naskirin; pesnê wî dibe armanc, ne amûrek ji bo armancek. Dema ku ew dibêjin ku Qazî Mihemed "ajanek Stalînîst" bû, ew bi rastî wî dixin vê qalibê: rêberek ku şopînerên xwe bi kesekî ve girêdayî kiriye ne bi welat. Welatparêzî, berevajî vê, evîna ax, gel, ziman û çandek hevpar e; dilsoziya bi "em"-ek kolektîf re, ne "wî"-yek takekesî. Welatparêzek dikare piştgiriyê bide rêberek, lê ev piştgirî şert e: heya ku ew rêber xizmeta doza kolektîf bike. Ger rêber ji xwestekî veqetandî be, welatparêz ji xwestekî re dilsoz dimîne, ne ji kesê re.

Xala navendî ew e ku kolonyalîst bi hêsanî dikeve nav rêxistinên takekesperestî û serdestiya wan dike, ji ber ku di rêxistinên wiha de, welat, zimanê dayikê û çand ne pêşîn in.

Dilsoziya endaman ber bi takekesperestiyê ve ye, ne ber bi ax û dîrokekê ve. Ev takekesê navendî xala girêdana rêxistinê bi cîhana derve re ye; ji ber vê yekê, heke kolonyalîst yan heman dagîrker bikaribe wî takekesî bikire, bitirsîne an jî ji holê rake, tevahiya rêxistinê dê zû hilweşe.

Bi rastî, takekesperestî "xalek têkçûnê" diafirîne: stûna sereke ya rêxistinê takekesî ye, ne xwesteke kolektîf e; ji ber vê yekê, bi rakirina wî takekesî re, pêkhateya rêxistinê hildiweşe.

Rêxistinek wisa di ax, ziman an rastbûna gel de kok tune ye, û ji ber vê sedemê, ew dikeve bin barê kolonyalîsmê û bi hêsanî tê hilweşandin an jî winda dibe.

Berevajî vê, rêxistinên şoreşger ên ku ji takekesîtiyê azad in, ziman, çand û axê didin pêşiyê. Dilsoziya wan bi "em" a kolektîf, bi axê û bi dîrokek hevpar re ye, ne bi rêberekî ku dikare were guhertin.

Dagîrker yan heman Kolonyalîst nikare bi tunekirina takekesek rêxistinek wisa tune bike; ji ber ku her gava ku ew rêberek ji holê radike, rêberek nû ji kokên gel derdikeve.

Ev rêxistin bi kokên xwe, bi eslê xwe, welatê xwe û dîroka xwe ve girêdayî ne, û ev girêdan wan ji kolonyalîsmê re neguhêzbar dike; ji ber ku "neteweyek" ku ji ziman û axa xwe hez dike, bi kirîn an jî tunekirina takekesek nayê teslîmkirin.

Ji ber vê yekê, ji bo têkbirina tevgerên wiha, kolonyalîst neçar e ku an serî li zordariya xwînî û berfireh bide, an jî wan weke "xayînên biyanî" bi nav bike û wan ji kokên wan ên neteweyî veqetîne - tam ew e ku bi girêdana Qazî Mihemed bi Stalîn ve hate kirin.

> **Herwisa şehîd Dr, Ebdulrehman Qasimlo jî takeperestî qedexe kiribû, çendîn caran di gotinên xwe de ev tişt red kiriye û gotiye ku takeperestî ne cih de ye.**

Xalek din jî cudahiya di mayîndetiyê de ye. Takekesîperestî bi derbasbûna demê û guhertina siyasî ve winda dibe: ji ber ku ew bi takekesek zindî ve girêdayî ye, ew bi mirin, îstifa, an jî bêrûmetkirina wî takekesî hilweşe, û bi her guhertina rejîmê re, kulta kesayetiya berê tê jibîrkirin. Lê ziman, çand û ax ne wisa ne; ew ji nifşan, dewletan û rejîman derbas dibin, û bi derbasbûna demê re, ne tenê ew winda nabin, lê ew bêtir kûr dibin.

Kolonyalîst dikare rêberek ji holê rake û kultek kesayetiyê bi yekî din biguhezîne, lê ew nikare zimanê ku dayik fêrî zarokên xwe dikin, çanda ku di dîrokê de kok digire, û axa ku mirov lê dijîn ji holê rake. Ev cudahiya di mayîndetiyê de ye ku takekesperestiyê qels û demkî dike, û welatparêziyê mayînde û bêşikest dike.

Cûdahî ev e ku ev pesnê ji jêr ve, ji dilê civateke neteweyî tê, û li ser "xizmeta" wî ye, ne li ser "pozîsyona" wî. Lê belê, zeliqandina Qazî Mihemed ji Stalîn re hewldanek ji jor ve bû ku wî veguherînin "kuklayek" hêzek biyanî.

Hikûmeta kolonyal (dagîrker) an navendî Qazî Mihemed wek Stalîn bi nav kir da ku şoreşa wî ji rehên wê yên neteweyî bêpar bike û darvekirina wî weke parastina "yekparçeyiya axê" rewa bike.

Lê li vir cudahiya bingehîn heye: takekperestî pesnê bêwate yê takekesî ye bi bihayê hilweşandina xweserekî, û ji ber ku ew xwe dispêre takekesî, kolonyalîst bi hêsanî kontrola wê digire destê xwe û bi derbasbûna demê û guhertinên siyasî winda dibe; ji hêla din ve, welatparêzî evîna civak, ax û ziman e ku ji jêr ve radibe û ji ber ku ew bi kok û dîrokê ve girêdayî ye, li hember kolonyalîzmê neguhêzbar û dimîne.

Ger pesnê Qazî Mihemed ji hêla gel ve pesnê "welat" bû, şbandina wî wek Stalîn hewldanek bû ku wê pesnê veguherîne "kesayetî" û bi vî rengî wê bêbawer bike. Lêbelê, dîrokê nîşan daye ku xweseriya neteweyî ji etîketan û derbasbûna demê dirêjtir dimîne.

# Kurd di navbera cudakarî û têkoşîna ji bo naskirinê de



N. Sefiye Xalidî



Mirov ne bi nijadperestiyê têne dinyayê. Pêşdaraziyên nijadperestî û etnîkî bi gelemperî ji têkiliya di navbera perwerdeya malbatê, hawîrdora civakî, tirs, girêdana bi komê re, nakokiyên siyasî û bandorên civakî de derdikevin holê. Ji nêrîneke psîkolojîk ve, girîng e mirov fêm bike ku nijadperestî ne tenê ji ber wê yekê çêdibe ku kesek ji kesekî din “hez nake” an jî “nefretê lê dike”. Ew pir caran gelek zûtir dest pê dike, bi taybetî jî bi dabeşkirina cîhanê bo koman: “em” û “yên din”. Pêdiviya mirovan bi hesta aîdiyetê (girêdanê) heye. Ew xwe bi malbat, ziman, ol, çand an neteweya xwe ve didin nasîn. Ev hesta aîdiyetê dikare ewlehiyê û hesta nasnameyê bide mirovan. Lêbelê, pirsgirêk dema derdikevin holê ku koma mirov bi rêya biçûkxistin an kêmkirina nirxê komên din tê bilindkirin. Ew ramana ku “Em aîdî vê neteweyê ne” dikare hêdî hêdî veguhere wê helwestê ku “Neteweya me ji yên din çêtir e”, û ji wir jî derbasî vê qonaxê bibe: “Yên din li gorî me nînin an jî ji bo me dibin gef.”

Ev mekanîzmayên psîkolojîk dikarin di sedema ku Kurd li xelkên Tirkiyê, Îran, Îraq û Sûriyeyê bi cudakarî, pêşdarazî, an dijminatiyê re rû bi rû dimînin de jî rolek bilîzin. Di heman demê de, girîng e ku tevahiya nifûsê şermezar nekin. Ne her kes li Tirkiye, Îran, an Sûriyeyê xwedî nêrînên nijadperest e an jî dijminatiya li dijî Kurdan dike. Wekî din, rewşên civakî û siyasî yên li van welatan ji hev pir cuda ne.

Lêbelê, mekanîzmayên psîkolojîk ên wekhev dikarin derkevin holê dema ku Kurd wekî gefek li ser yekîtiya dewletek an neteweyek tê nîşandan. Tirs faktoreke bi taybetî girîng e. Mirov gelek caran li hemberî komên ku wan wekî gefekê dibînin, pêşdaraziyan pêş dixin. Ne hewce ye ku mirov bi xwe rastî wê gefê hatibe, bo nimûne, dibe ku kesek qet ezmûneke nebaş bi kesekî Kurd re nejiyabe, lê dîsa jî nêrînên neyînî derbarê Kurdan de hebe. Dibe ku ev cure nêrîn ji malbat, dibistan, daxuyaniyên siyasî, medya an jî hawîrdora civakî ya kesekî derkevin holê. Heke kesek ji temenekî zû ve dubare bibihîze ku komeke etnîkî ya taybet bêsoz e, hewl dide welat parçe bike an jî ji bo civakê dibe sedema xeteriyê, dibe ku ev îdia di hişê wî de bi kûrahî bi cih bibin. Wê demê, dibe ku ew kes bêyî ku wê mijarê bi awayekî rexneyî binirxîne, wê komê wekî dijmin bibîne.

Ji aliyê psîkolojîk ve, giştîkirin bi taybetî pirsgirêk e. Dema ku komên siyasî, rêxistin, an nakokiyên taybetî bi tevahiya nifûsa etnîkî re têne wekhev kirin, wêneyek çewt derdikeve holê. Redkirina rêxistinek siyasî ya taybetî dikare bibe nebaweriya bi mîlyonan kesan. Ramana “Ez vê komê an rêxistinê red dikim” ji nişkê ve vediguhere “Ez baweriya xwe bi Kurdan naynim.” Bi vê yekê, rastiya ku Kurd ne komeke siyasî ya yekreng in tê paşguhxistin. Mîna her nifûsa din, ew ji kesên xwedî raman, ol, awayên jiyanê û baweriyên siyasî yên cihêreng pêk tên. Ramana nijadperest vê cihêrengiyê hêsan dike û mirovan dixe nav taybetmendiyek yekane: etnîsîteya wan.

Mekanîzmayeke din a psîkolojîk lêgerîna qurbaniyekê ye. Mirov zehmetiyên aborî, bêkarî, nezelaliya siyasî, an jî dilşikestina kesane dijîn. Pirsgirêkên weha pir caran tevlihev in û ji gelek sedeman derdikevin. Lêbelê, ji hêla psîkolojîk ve hêsantir e ku komeke taybetî berpirsiyar were girtin. Li şûna ku bi dînamîkên siyasî an aborî yên tevlihev re mijûl bibin, ravekirinek hêsan derdikeve holê: “Ev kom sûcdar e.” Di encamê de, kêmnetewe dikarin bibin qurbaniyên pirsgirêkên ku bi rastî sedemên wan bi tevahî cûda ne. Her çend ev zîhniyet ji hin kesan re hestek kontrolê ya demkurt peyda dike jî, di demek dirêj de, ew dibe sedema cudakarî, dûrxistin û dabeşbûna civakî.

**Malbat û jîngeha civakî ya mirov jî roleke girîng dilîzin. Pêşdarazî her tim bi awayekî eşkere nayê hînkirin, ew pir caran bi rêya gotinên nefermî, henekan, an jî şîroveyên biçûkxistinê tê veguhestin.**

Zarokek dibîne ka mezin çawa li ser Kurdan diaxivin û fêr dibe ka kîjan helwest di nav çerxa wan a civakî de normal têne hesibandin. Ger kes van gotinan red neke, ew dikarin di dawiyê de wekî rastî werin dîtin. Fişara hevalan vê bandorê xurt dike. Hin kes ji tirsa ku ji koma xwe werin derxistin - her çend ew bi xwe çend pêşdarazî hebin jî - li ser komên etnîkî yên din nêrînên biçûkxistinê diyar dikin. Carinan cesaret lazim e ku meriv li hember gotinên nijadperest raweste, nemaze dema ku ew di jîngeha civakî ya mirov de wekî tiştekî asayî têne hesibandin.

Ji aliyekî din ve, hevdîtinên şexsî dikarin bibin alîkar ku pêşdarazî werin şikandin. Nêrînên nijadperest bi taybetî bi hêsanî derdikevin holê dema ku mirov bi koma ku ew darizînin re têkiliyek kesane ya hindik hebe. Ew kesên ku Kurdan tenê bi rêya nîqaşên siyasî, nûçeyan, an medyaya civakî nas dikin, îhtîmal e ku wêneyek hêsankirî biafirînin. Dostaniyên şexsî, xebata bi hev re, cîrantî û axaftinên rastîn dikarin wê wêneyê biguherînin. Ji nişkê ve, “Kurd” dibin kesekî rastîn bi dîrok, malbat, kesayetî û ramanên xwe. Tam li vir derfetek sereke ji bo derbaskirina pêşdarazîyê heye: dîtina mirovan ne wekî beşek ji girseyek anonîm, lê wekî takekesan.

Ji perspektîfeke psîkolojîk ve, cudakariya ku Kurd li Tirkiye, Îran û Sûriyeyê pê re rû bi rû dimînin, nikare tenê wekî pirsgirêkek takekesî were dîtin ku bandorê li ser mirovên taybetî dike. Ew herwisa bi nakokiyên dîrokî, nasnameyên neteweyî, propagandaya siyasî, şertkirinên civakî û dînamîkên desthilatdariyê ve girêdayî ye. Psîkolojî dikare ji me re bibe alîkar ku em fêm bikin çima mirov stereotîpên dijminane pêş dixin, çima ew li ser tevahiya koman giştî dikin, û çima tirs carinan ji ezmûna kesane girantir e. Lêbelê, ev têgihîştin nabe hincetek ji bo nijadperestî an cudakariyê. Berevajî vê: têgihîştina ka pêşdarazî çawa derdikevin, dîtina ka ew çawa dikarin werin astengkirin û ji holê rakirin hêsantir dike.

Di dawiyê de, ramana nijadperest pir caran li cihê ku mirov êdî ferdî nabînin dest pê dike. Dema ku bi mîlyonan Kurd tenê dibin taybetmendîyek, tevgerek siyasî, an stereotîpek neyînî, kesayetiya wan winda dibe. Ji ber vê yekê, gava herî girîng di têkoşîna li dijî nijadperestiyê de ew e ku meriv cûdahiyê di navbera ferdan û tevahiya komeke etnîkî, di navbera rexneyên siyasî û nefreta etnîkî, û di navbera kiryarên rastîn û pêşdaraziyan de bike. Mirov dikarin xwedî nasname, ziman û çandên cûda bin û dîsa jî endamên wekhev ên civakekê bin.

Li cihên ku parastina navneteweyî tune ye an jî têrê nake, gelek Kurd neçar in ku di serî de pişta xwe bidin hêza xwe ya kolektîf. Piştevanî, piştevaniya dualî û hişmendiya li ser mafan dikarin wekî awayên girîng ên parastinê xizmetê bikin. Pêwîst e binpêkirinên mafên mirovan û bûyerên cudakariyê bên belgekirin û ragihandin da ku ew neyên jibîrkirin. Rêxistinên jinan, komên mafên mirovan û civaka sivîl di vî warî de roleke sereke dilîzin, bi taybetî di warê bilindkirina dengê kesên ku bandor li wan bûye û kişandina bala navneteweyî de. Di heman demê de, parastina ziman, çand û nasnameya Kurdî hêmaneke girîng a berxwedana aştiyane ya li dijî marjînalîzekirinê ye. Li cihên ku parastina dewletê an ya navneteweyî kêm dimîne, piştevanî, perwerde, piştevaniya yasayî û avakirina torên navneteweyî dikarin alîkariya bihêzkirina berxwedêriya gel bikin û derfetê bidin mirovan ku daxwaza mafên xwe yên mirovan bikin.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Cinayetekî Hovane li Piranshahrê, Nîlûfer Mucawir Piştî 10 Rojên Êşkenceyê Jiyana Xwe Ji Dest Da



Keça 27 salî ya Kurd, Nîlûfer Mucawir ku xelka bajarê Piranshahrê ye, piştî ku ket ber êşkence, destdirêjî û kiryarên gelek hovane, mejiyê vê ji kar keft û jiyana xwe ji dest da.
Li gorî agahiyan, kesekî bi navê Seyîd Îzedeđîn Seyîdtahirî bi xapandinê Nîlûfer revandiye û 10 rojan li cihêkî nediyar girtiye. Di vî heyamê de, wî ew ji av û xwarinê bêpar hiştiye û tundûtîjiya fizîkî û cinsî ya gelek dijwar li dijî wê bi kar aniye. Hovîtiya êşkenceyê gihîştiye astekê ku piştî rizgarkirinê û veguhastina bo nexweşxaneyê, mejiyê wê keçê ji kar ketiye. Ji ber zirarên giran ên li ser laşê wê, tenê du gurçikên wê saxlem mabûn ku malbata wê piştî mirina mejiyê keça xwe, gurçikên wê bexşîne kesekî nexweş û mihtacê gurçikan bû.
Ev tawanbariya tirsnak civak hejandiye û malbata Nîloferê doz li dijî tawankar vekiriye. Tevî giraniya vê cinayeta li dijî mirovahiyê, nûçeyên dawî diyar dikin ku sûcdar piştî çend rojan hatiye binçavkirin.
Wê bûyerê wîjdana hemî wn kesane hejandiye ku haydarê vê nûçeya hovane bûn, vê yêkê li torên civakî de gelek bertek bi du xwe de anîn û ev pirsyare anî pêş, Gelo di wî serdemî de cinayet û hovitiyên wiha dirindane kê dikare bike?
Bê guman kiryarên wiha nemirovanê bandore dikne ser civatgehê û xelkê nigeran dikin.

## Raporta binpêkariya Mafê Mirovî li çend rojên derbasbûyî li Kurdistanê de





Li gorî raporta rêkxiravên Mafê Mirovî, çend welatiyek li Kurdistanê de ji wan jinek li heyama rojên derbasbûyî de, ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine girtin, û li ser çarenivîsa wan ti zanyariyek li ber dest de nîne.
Li gorî nûçeya malpera (Xweragirî) roja Sêşemî, 10ê Xermananê, hêzên tepeserkar ên rejîmê rijiyane ser gundê Kesnezan yê girêdayî bajarê Seqizê, û jinek ya bi navê Nahîd Kesnezanî girtine.
Hêzên rejîmê dest bi ser alavên kesî yên wê jinê de grtine û heya niha li sedema girtin, tohmeta biser de hatî sepandin û cihê ragirtina wê ti zanyariyek li ber dest de nîne.
Li gorî raportek din a Xweragirî, Mihemed Hemzezade, welatiyê xelkê bajarê Mihabadê nêzî 10 roje ji aliyê hêzên tepeserkar ên rejîmê ve bi bê hebûna belgên yasayî hatiye girtin û heya niha jî çarenivîsa wî nerohn e.
Herwisa li raportek din a Xweragirî de, behsa vê hatiye kirin ku roja Sêşemî, 10ê Xermananê, hêzên rejîmê rijiyane ser mala Erkan Ehmedî, welatiyê xelkê bajarê Merîwanê, bi awayekî dirindane bi bikaranîna kiryarên tundûtîjî navbirî girtine û bo cihek nexûya veguhastine.
Hevdem Xweragiriyê ragehand ku, Hejîr Yeqûbî welatiyê xelkê Qurwe, bi sedema beşdarîkirin li nerizatiyên Befranbara derbasbûyî de, ji aliyê binav dadgeha Înqilaba rejîmê ve, sizaya salek girtinê û lêdana 31 derbên qamçiyan bi ser de hatiye sepandin.

## 58 welatiyên Pîranşarê ji ber lixwekirina cil û bergên Xakî bi cezaya pereyî hatin cezakirin



Li gorî nûçeya ku gihîştiye beşa nûçeyan a Navenda Ragihandinê ya PDKÎ, roja Şemî 7ê Xermananê, 58 welatiyên Pîranşarê ku sala borî bi lixwekirina cil û bergên Xakî beşdarî şahiyekê bibûn, dadgeha şoreş a rejîmê li Urmiyê, her yek ji wan 58 welatiyan bi 20 milyon tomanî neqidî ceza kirin.
Roja Çarşemî 25ê Pûşperê 1404ê, civîna dadgehîkirina 58 welatiyên Pîranşarê hat lidarxistin û ji ber lixwekirina cil û bergên Kurdî yên Xakî hatibûn binçavkirin û ji bo wan dosya hatibû vekirin.
Ev 58 welatî bi tohmeta «propagandayê li dijî rejîmê» di şahiyekê de û piştî belavbûna berfireh a vîdyoyên wan li ser turên civakî hatin gazîkirin bo yek ji tayên lêpirsînê yên Dadgeha Şoreş a Pîranşarê.
Piştî sepandina vê cezaya neheq, piraniya van 58 kesan her bi cil û bergên Kurdî beşdarî civîna dadgehkirinê bûn.
Hêjayê gotinê ye ku piştî van hewldanên rejîmê, xelkê Kurdistanê biryar da ku Newroza sala borî bi navê «Newroza Xakîpoşan» bê nasîn û bi vî awayî bersiveke tund da karbidestên rejîma Îslamî.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (525)